

**Mistefa Pîranî:**

*“Birayekî min di nav refên pêşmergeyên PDKÎ de şehîd bûye, û ez jî zêdetir ji 30 salî ye ku pêşmerge me, û zêdetir ji her demekê ez bi serkevtina gelê xwe hêvîdar im”*

8

**Qasim Keleşî:**

*“Ew 59 ciwanên Mehabadê moralek bilind he-bûn”*

4




# AGIRÎ

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (207) 05-06-2013 Buha (150) Tûmen


**NY: Sûriyê çekên kîmyayaî bi kar anîne**

Paolo Pînaryo serokê komsyona lêkolînên NY di civîna şêvra mafê mirov li Jinêvê ragehand ku, lêkolîn vê yekê îsbat dikin ku di heyvên Nîsan û Gulana Îsal de bi kêmî ve çar caran di herêmên derdora Heleb, Dîmeşq û Serqibê, çekên kimyayî li dijî xelkê hatiye bikar anîne.

Hevdem welatên Firansa û Birîtanyayê jî eşkere kirin ku di şerê navxwe ê Sûriyê de ji gaza “Sarîn” mifah hatiye wergirtin.

# Sûriye: Turkiye aloz e, neçne wir!

## Beşar Esed: bila Erdoxan dest ji kar berde



**Di qada Teqsîmê de pevçûn**

**Di navbera erteş û PKK de şer**

**Buhara Turkî ne di rê de ye**

2

Rojnameya agirî di Malperên WWW.Kurdistanmedia.com û WWW.agirimedia.orgde bixwînin. Herwiha rexne û pêşniyarên xwe bo Emaila agiri2003@gmail.com ji me re bişînin


AGIRÎ

*Ev stêrkên ku hez dikirin hevjîna wan ji wan biçûktir be*

*Temenê wî sê sal e, lê fotogirafer-ek pirofîşnal e*




**Miqestikên bê nav ên Îmamê**

7




**Hilbijartin û rola jinê**

5

www.arsivakurd.org

Sergotar

## Îranê dîsan terorîst girtin

Şehab Xalidî

Wezareta Îtilaata Îranê wek her car dîsan jî bona belengaz nîşandana xwe, û bona vê ku tenûra rakêşana xelkê bo ser sindûqên hilbijartinê germ ragire, ragehand ku wan girûpek destbiser kiriye ku dixwastin hejmarek ji kesayetiyên siyasî û ayînî ên ser bi neteweyên cuda li Îranê de teror bikin, û piştre vê yekê bixin stûyê dewletê. Li gorî daxuyaniya wezareta Îtilaatê, welatek Erebî bi Îsraîlê re ew girûp perwerde kirine û bona encamdana karê têkderane şandine wir. Her di wan çend rojan de ku li Îranê de bas basa hilbijartinê ye, eva cara sêyemîn e ku rejîma Komara Îslamiya Îranê nûçeyên weha diweşîne.

Ew daxuyaniya wezareta Îtilaata Îranê di demekê de ye ku cuda ji vê ku li wan çend mehên borî de çend girûpên terorîstî di welatên curbicur ên cîhanê de hatin girtin û bixwe ew tawan kişane stûyê xwe ku dezgehên Îtilaatî ên Îranê ew şandin. Her çend rojan berî niha girûpek li Turkiyê de hate girtin ku jin bûn û navê "Miqesokên bê nav ên Îmamê zeman" li ser wan hatiye danîn û bona karê sîxorî û ajantiyê bo wir hatibûn şandin.

Bê guman mifahwergirtina ji jinan bo karê sîxoriyê gellek hêsantir û rihettire ji bikaranîna mêran bo vî karî, lewra jî hikumeta ku xwe wek hikumeta Îslamî bi nav dike, jinan bo karên fehşa û sîxoriyê bi kar tîne.

Ji aliyek din ve di demekê de Îran basê destêwerdana welatên Erebî li nav karûbarên xwe de bi alîkariya Amerîka û Îsraîlê dike ku welatên Erebî heya niha bi dehan belge li ser destêwerdanên Îranê li herêmê de bila kirine û ji destê Îranê aciz in.

Şandina girûpan bo welatên herêmê gihîştiye astekê ku welatên kendavê li bajarê Cedê de civînek lidar xistin û têde qala belgeyên curbicur li ser destêwerdana Îranê li nav karûbarên xwe de kirin û ew kiryarên rejîma Îranê bi tundî şermezar kirin.

Bêguman ew hemû siyasetên têkderane nikarin heya dawiyê rejîmê li ser pê ragirin û dîrok di vî warî de baştirîn şahid e.

## PDKÎ di rêûresma YNK de beşdarî kir



Kurdistanmedia: Şandekî Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi serperestiya rêzdar Mistefa Hicrî Sekreterê giştî yê PDK Îranê beşdariya 38'emîn salroja damezrandina Yeketiya Nîştemanî a Kurdistanê li bajarê Hewlêrê kir.


Di vê marasimê de rêzdar Mistafa Hicrî pîrozbahiya Deftera Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê pêşkeşî hevalên Mektaba Siyasî a Yeketiya Nîştemanî a Kurdistanê kir û hêviya serkevtin li pêxema xizmet bi armancên gelê Kurd bo xwast.

Heyeta Partiya Demokrat a Kurdistan Îranê di vê rê û resmê de li gel çendîn kesayetiyên siyasî û nûnerên Partî û aliyên siyasî hevdîtin kir

berî beşdariya vê heyetê, heyetek PDK bi serperestiya Teyîmûr Mistefayî endamê Deftera Siyasî bi hinceta pîrozbahiya 38'emîn sala avabûna YNK serdana Melbenda 14'a rêxistina Koyê kiribû, û ji aliyê heyetekî Melbendê bi serperestiya Rehberî Seîd Biraîm endamê serkidayetiya YNK ê û serperstê Melbendê, hatibûn pêşwazîkirin.

Di vê serdanê de rêzdar Mistefayî serbarî pîrozbahiya 38 saliya damezrandina (YNK) hêviya temendirêjî û tendurustiya Mam Celal xwastibû.

# Sûriye: Turkiye aloz e, neçine wir



Piştî wan aloziyên ku li Stembolê derketin, Beşar Esed daxwaz li Erdoxan kir ku bila dest ji kar berde, û wezareta karê derve ya Sûriyê jî daxwaz kir ku bila tu kes neçe Turkiyê, jiber ku ew der ne aram e.

Heta wan bas ji Buhara Turkî jî kirine ku rû li Turkiyê kiriye, lê wan gotinan dewleta Turkiyê pirr êşandiye û Erdoxan got ku em bawer nakin ku Buhara Turkî li rê de be.

Ji aliyek din ve cîgirê Erdoxan ragehang ku 13 aliyên siyasî dest di wan aloziyan de hene. Li gorî gotina wan di aloziyên Stembolê de, zirarek pirr mezin gihîştiye ciyên giştî û xeyrî dewletî jî.

Herweha serbarê wan aloziyan li Roboskiya Şirnaxê de jî di navbera PKK û hêzên dewleta Turkiyê de şer derket.

Di vê derheqê Demîrtaş ragehand ku her çend şerek sivik rû daye û kuştî tunebûn, lêew yek dikare pêvajoya aştiyê lerzok bike. PKK jî ragehand ku heke êrîşên bi vî awayî berdewam bin ewê bi tundî bersiv bidin.

www.arsivakurd.org

# Şîva Xerîban û hilverîna pel gan Beşa 2



*‘Dengê Celal digihîşte guhê min, ew deng dengê mirina wî bû ku li jêr îşkencê de dikre hewar, û daxwaza alîkariyê dikir, li ber çavên min her tişt miribû’*

Di doma vê siyaseta karesatbar û sitemkarane de roja 12 Xermanana sala 1358’an (1979) êrîşa hovane bo ser mîhwera Bêwrê û Bêwranê dest pê kir. Di vê êrîşê de zirarek canî û malî gihîşte xelkê vê herêmê û gund jî vala û nîve vala man. Her di doma vê siyasetê de roja 18’ê Xrmanana sala 1358’an hêzeke mezin ya Komara Îslamiaya Îranê teyar bi tank û top û çekên giran û nîve giran ên curbicur li jêr piştevaniya hîlîkopterên topdar bi armanca girtin û cihgirbûna li nuqteyên hestyar û sitratejîk ên Mîrawê û Alwetan de ber bi mîhwera Serdeşt û Pîranşarê çû, lê bi berberekaniyê re berbirû bû. Di rastî de niha êdî ew dewrana derbas bûye û gellek kirêt e ku em bên û basa teqe teqê û li hevdu rakêşanê bikin, lê li vir de aliyê kêm ez wek xwe nikarim pênûsê bi qestî bi ser berxwedaniya vê rojê de bikêşim û bixwe jî karek weha bikim ku rabûn û berberekaniya vê rojê li dîroka PDKÎ de bihê parve kirin, yan aliyê kêm weha kêmreng be, ku bihagiraniya xwe ya dîrokî ji dest bide. Keseke cihê baweriyê ji min re bas kir ku li dema rûniştina Deftera Siyasî li herêma “Aşî Piştkawê” bas ji giringiya roja 18’ê Xermanana sala 1358 (1979) û herweha teşwîqkirina pêşmergeyên beşdarbûyî li meşa vê rojê de hate kirin, yek ji wan kesan ew helbesta xwend: “Gah başed kê kûdekî nadan, bi Xelet ber hedef zened tîrî”, (car heye ku zarokek nezan bikare bi şaşî tîrekê li armancê bixîne”. Lê di rastî de bi gotina dost û dijmin, û heta xelkê bê alî jî, helwesta vê rojê yekemîn berberekaniya tund bû ku hêzên komara îslamiya Îranê pêre berbirû bûn.

Li vir de ez naxwazim ku bas ji hûrdekariyên vê pevçûnê bikim, ez kurt bibrrim, hêzên rejîma Îranê vê rojê weha şikest xwarin ku bixwe jî rû çinebûn ku basê bikin, lê sed mixabin vê rojê li dawiya vê pevçûnê de hevçeperê dilsoj û emegdar Mele Osman Yezdanperest naskirî bi Celal Mîraweyî li ber çavê min bi dîl girtin, serbarê vê hemû têkşikanê, dijmin dîlgirtina navbirî wek deskevtek mezin hesêband. Helbet mirov ya rast bêje, girtina Celal bo pasdaran deskevtek kêm nebû, dijmin li jêr agirê hilîkopterên topdar de, bi ser şorî paşekêşe kir. Me birîndarek hebû, ku herçend birîna wî kûr nebû, lê gellek xwînrêjî dikir, têhnêtiyê pişta me şikandibû û birîndarê me jî berdewam daxwaza avê dikir, li rastî de ez bixwe jî, ji wî têhnîtir bûm. Tu îmkanateke dermanî jî me tunebû. Di vê demê de ji nişkêve Bêhrûz Kurd Ehmedî wek firişteyekê derket, ew gellek peyt, û zîrek hate ber çavê min, min ew nas nedikir û min sipasiya wî kir, min jêve bû ku ew Komele yan Çirîk e. Lê wî bi girnijîn ve gote min ku ew pêşmergê PDKÎ ye. Baş li bîra min de ye ku gellek barût çûbû nav gewriya min de, û bi tewahî gewriya min hişk û zuha bibû. Min jane serek zêde hebû, û berçavê min tarrî bibû, wî aspirînek da min, lê min av tunebû ku ez vê aspirînê pê bixom, û tewaw ez bê taqet kiribûm. Ew aspirîn li nav gewriya min de sekinîbû, û pêve zeliqîbû, kaka Bêhrûz mistek nav pişta min da û ew heb li devê min de derket. Kak Bêhrûz wê demê ji aliyê Mamosta Hêmin û hevalên wî ve bo aliyê me hatibû şandin.

Mamosta Hêmin û hevalên wî gellek ji me dûr nebûn û kak Bêhrûz cihê wan nîşanî me da, û bixwe jî bona peydakirina guhdirêjekê berev gundê “Wawan” rê ket nuqteya rast ya pevçûnê “kelha Hemze” bû, ku ketibû navbera “Wawan” û “Tengî girjalî” de. Roja şehîdkirina Celal Mîraweyî jî roja 18’ê Xermanan 1358’an e, ku li hinek ciyan de roja 24’ê Xermananê hatiye nivîsîn. Ez û hevalê xwe yê birîndar em hêdî hêdî çûne aliyê mam Hêmin û hevalên wî. Me hinek evraz û nişîv derbaz kirin, lê me çi kaniyek nedît, û tênîtî û birsîtiyê pişt li me şikandibû, em çûn û me xwe gihande ciyê mam Hêmin û me dît ku wan dezgeha çapê û alavên çapê bi awayek demikî li wir danîne û bêhna xwe vedidin.

Êvariyek tarî û xembar bû, û deh yan dozdeh rojek ji havînê mabû, serê çiya sipî bibû, havîn bidawî dihat û payîza zer û xembar nizîk dibû, carna bayek hênik li gel haşe haşa rûbarê Kellwê têkel dibû, û xwe li ser û çavên me dixist. Ji aliyek din ve dengê Celal digihîşte guhê min, ew deng dengê mirina wî bû ku li jêr îşkencê de dikire hewar, û daxwaza alîkariyê dikir, li ber çavên min her tişt miribû, û tarîtiya mirinê li jêr hovên curbicur de xwe li rih û hestên min dixistin. Celal wek “kilûkên cotkaran” ku bi hemû nermî û nazikiya xwe piştî derketina gelawêjê li nav erdê req û hişik de serî dirakin, û piştre zû perper dibin, ew jî gellek bê wext perper bû......

# Çalakiyên dîplomatîk ên birêz Hesen Şerefî berdewam in



Rêzdar Hesen Şerefî cîgirê sekreterê giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê hevdîtinek li gel karbidestên partiya Sosyalîst û partiya Komonîst a welatê Ferasê pêk anî.
Li gor rapora malpera Kurdistanmedia, Hesen Şerefî cîgirê sekreterê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Xosro Ebdullahî berpirsê pêwendiyên PDK Îranê li Feransê û li gel Kerîm Pakzad berpirsê rêkxistinên partiya Sosyalîsta Feransê û karûbarên pêwendiyên navdewletî civîyan.
Di vê hevdîtinê de komek bas û mijarên siyasî ên pêywendîdar bi Îran û Kurdistanê hatin ber bas, û her di vê rûniştinê de pirsa pirograma etomî ya rejîma Îranê û jiyana pirr îza ya hemwelatiyên Îranê bas lê hate kirin.
Rêzdar Hesen Şerefî li dirêjahiya hevdîtina xwe li welatê Feransê de, li gel heyeta partiya komonîst a Feransê li Parîsê jî kom bû.
Di vê rûniştinê de birêz Hesen Şerefî basa rewşa aborî, siyasî û civakî a xelkê Îranê, bandora gemaroyên ser rejîma Îranê û hemwelatiyan, pirsa şanoya hilbijartinê û tevgera kedkarî, jinan û mamostayan bo vê heyetê kir.
Rêzdar Hesen Şerefî li dirêjahiya axavtina xwe de li ser tepeserkirina netewên Îranê bi taybet Kurdan û xebata netewên zilmlêkirî yên jêr desthelata Îranê kir.
Pirsa Sûriyê û piştewaniya rejîma Îranê ji Beşar Esed û rewşa netewa Kurd li her çar parçên Kurdistanê tewerek din a vê civînê bû.
Heyeta patiya Komonîst a Feransê pêk hatibû ji: Lîdya Semer Bexş berpirsa pêywendiyên navnetewî, “Sîlwî Jan” berpirsê karûbarên pêywendîdar bi tevgera Kurd û “Partîk Mergetî” berpirsê komîsyona lêkolîna li ser xebata azadîxwazan li Rojhelata Navîn de.

www.arsivakurd.org

# Qasim Keleşî pêşmergê kevnar ê PDKÎ:



## *Morala wan 59 ciwanên Mehabadî ew qas bandor li min kir ku ez heya niha jî hest bi mandîbûnê nekim û berdewam bim li ser xebatê*

**Rast 30 sal bi ser vê rojê de derbas bû ku fermandariya bajarê Mehabadê di daxuyaniyekê de nûçeya pirr dilêş ya îdama 59 kulîlkên azadiyê, 59 ciwanên leheng ên Mehabadê, bi awayeke berfireh di nav bajarê Mehabadê de, bilavkir.**

**Li gorî gotina Celayîpûr, ew 59 ciwanên Mehabadê endamên PDKÎ û Komelê bûn û ji bo wan karê siyasî dikirin, lewra hatin girtin û piştre li dadgeha şoreşê ya Tewrêzê de hukmê îdamê ji wan re hatiye birrîn û li Tewrêzê de hatine îdamkirin.**

**Di salvegera îdama wan ciwanên şoreşger de me hewce zanî ku em gotûbêjekê di vê derheqê de li gel birêz Qasim Keleşî kadrê kevnar ê PDKÎ bikin ku heyamekê bi wan re li girtîgehê de bûye û ji nêzîk ve ew nas kirine û şahidê cesûrî û lehengiya wan bûye, û zêdetir ji du mehan bi hevre li girtîgeha bajarê Urmiyê de bûne.**


Me di destpêkê de ji birêz Qasim çawaniya nasyariya bi wan 59 kesan re, jê pirs kir, wî jî weha bersiv da: "Roja 27'ê Reşemeya sala 1361'an(1983) bû ku 59 kes anîn bo girtîgeha Urmiyê, û gotin evne xelkê Mehabadê ne, û karê siyasî kirine. Piştre ku min zanî ku kesên welatparêz in, ez bi wan re bûme heval".

Navbirî herweha derheq morala bihêz ya wan girtiyan de got: "Yek ji wan girtiyan bi navê Kemal, rojekê gote min ku me her 59 kesan wek endamên Komeleya Jiyaneweya Kurd wate (J- K), sond xwariye ku em îxanetê bi yektir û bi çi Kurdekî nekin. Em li ser Kurdîniyê hatine girtin, û em şanaziyê bi xwe dikin. Em ji vê natirsin ku ew me bikujin, belkû em dilgiran in bi vê ku temenê me hêşta kêm e, û me nekarî bi qasî ku hewce ye, em li xizmeta gelê xwe de bin."


Birêz Qasim Keleşî ku her di wan rojên girtîgehê de bi sedema hevaletiyta bi wan 59 kesan re, lêpirsîn lê hatibû kirin, weha bîreweriyên wan rojên nexweş li girtîgehê de bi me re parve kir: "Rojkê yek ji berpirsên girtîghê di rîza wergirtina xwarinê de, gote yek ji wan hevalan bi navê Salih, ku tu gellek zêde diaxivî û axaftinên te pirr watedar in û Salih di bersivê de gotê ku heke me serî tevandiba, li bajarê Mehabadê de, emê bêdeng bana, û we jî em nedianîn vir, lê xatircem bin ku em 59 kes ji we re tiştek nabêjin ku hûn dilê xwe pê xweş bikin, me kes nekuştiye, tenê li Mehabadê de rêpîvanek hebûye û em jî têde beşdar bûne, we jî bi sûçê endametiya hizbê em girtine, heke weha be, gelê Kurd bi tevahî li Kurdistana Îranê de endamên partiyan in, gelo ma dibe ku kurd bi tevahî bêne girtin. Her piştî wan axaftinan, salih birin û gellek jî îşkence kirin".

Birêz Qasim Keleşî tevî vê ku birina wan 59 ciwanên Kurd bo îdamê wek bîreweriyek herî nexweş a xwe li dema girtîgehê de bi nav kir, weha bas ji morala pir bihêz ya wan ciwanên Mehabadê ji me re kir: "Rojekê çend berpirsên girtîgehê hatin û gotne wan 59 kesan ku xwe bo demjimêr 6'ê sibê amade bikin. Lewra vê şevê me pir bi hevra qise kir û piştre wan bo cara dawiyê xatirê xwe ji me xwastin,û êdî qet venegeriyan. Piştî heyamekê malbata min hatne dîtina min, û gotne min ku pêşmergeyên hêza Bêstûn a PDK Îranê ji bo tolhildana wan 59 îdamkiriyan, 59 emeliyat encam dane. Dema ew yek min zanî, min hest kir ku her 59 kes jî sax bûne".

Di dawiya vê hevdîtinê de birêz Qasim rêz û hurmet ji yad û bîra wan girt û got ku morala wan, ew qas bandor li wî kir ku ew heya niha jî hest bi mandîbûnê neke û berdewam be li ser xebatê.



# Nerîna Lîderan




**Hebûna du hêzên çekdar li herêmêm Kurdakincî li Sûriyê şerê navxweyî wê pêk bîne.**




**Erdoxan bila dest ji kar berde û guh li daxwazên xelkê nerazî bigre**




**Birêveberiya xirap ya dewletê bû sebeb ku gola Urmiyê hişk be**

Yazdehemîn gera hilbijartina serkomariyê li Îranê de, li demekê de birêve diçe ku gellek ji jinên Îranî û heta ew jinên ku bi awayekê li dewra bazineya deshilatê kom bûne, hêviya wan bi serkomariyê bûye bilqa ser avê, û nekarîne heta bo carekê jî, ji fîlterên Konseya Nobedar re derbaz bin, retkirina kêrhatiya jinan, girêdayî bi maddeya 115'ê ya yasaya bingehîn a Îranê ye, ku wek pêşmerc bo xwe berbijarkirinê qala "recolên mesebî û siyasî" dike, wate mêrên ayînî û siyasî. Diyare ên ayînî jî divêt ser bi mesebê Şîeyên dozdeh îmamî bin, û mêrên Sunnî meseb jî, ji vê sansorê bê par nebûne. Di vê derheqê de me bîrûboçûnên çend jinên çalak ên siyasî û çalak di warê mafê jinan de wergirtiye, ku li jêr de hatiye:



## Sûreya Felah

Îsal û di yazdehemîn dewra hilbijartinên serkomariya Îranê de, jinan pitir ji gerên borî xwe bo vê postê berbijar kirin. Yek ji wan 30 jinên beşdar di hilbijartinê de bi navê Sureya Melekzad ragehand ku, hekî ez bibim serkomar, ezê kabîneya xwe wê di navbera jin û mêran de bi awayek 50, 50 dabeş bikim. Ayetullah Yezdî jî di bersiva wê de dibêje ku, "Di serdemên kevnar de rêya wî nedidan ku derbasî gund be, wî pirsyar dikir ku mala Koxa li kû ye? Eva jî bi vê wateyê tê ku di Komara Îslamî û bi giştî welatên Îslamî de nabe bas ji hilbijartina jinan bihê kirin, jin nikare di posta serkomariyê de be û eva jî, ji yasaya bingehî a Komara Îslamî çavkanî digire.

Madeya 115'ê ya yasaya bingehî a Komara Îslamî derheq hilbijartina jinan, ji peyva "Rêcalê Siyasî" mifah wergirtiye. Wateya han jî bandor xistiye ser mêrên siyasî û têgehiştî di hikumetê de, lewma piraniya kesên ku mezhebî û olî ne, weke Mihemed Yezdî di Komara Îslamî de piştewaniya vê bendê dikin.

heta çend sal berî niha dema ku xanima Taliqanî xwe bo posta serkomariyê di Îranê de berbijêr kir, bi eşkere ragehandin ku jin nikare di pirojeya han de beşdar be û eva bi dijî yasaya bingehî a Komara Îslamî ye. Ev gotinên han arîşeyên zaf di nav civaka Îranê û bitaybet di nav jinan de pêk anî û cihê dilxweşiyê bû.

Xanimek bi navê Tûran Welîmorad her di vê peywendiyê de nameyek nivîsî û tê de Ayetulla Yezdî û endamên din ên Şivra Nobedar kêşa bin pirsyarê û ragehand ku, serbarê wê ku pirsyara mala koxa dikin, belkî mal mala me ye û "Rêcalê Siyasî" bi tenê mêran nagire, belkî bas ji bijardeyan dike û bo kesên siyasî ye. Pirsyar jî ev e ku gelo bi rastî "Rical" tenê bi mêran tê gotin yan kesatiyan?

Di heyamê pitir ji 30 salên derbazbûyî de gellek jinên çalak û mafxwaz ên Îranî xebitîne bona vê ku di civakê de mafên xwe wekhev bikin û em hemû jî dizanin ku di yasaya bingehî a Îranê de 11 heya 12 made hene ku bi eşkere vê yekê di selimînin ku wekhevî di navbera jin û mêran de tuneye, çi li jiyana takekesî de û çi ji aliyên din weke telaq, avakirina jiyana hevbeş, kevirbarankirina jinan, kuştin bi tawana şeref û namûs û ... hwd. Jin bona rakirina ew diyardeyên qirêj û yasayên dije mirovî pir xebitînê. Em dikarin bêjin ku di hindek biyavan de bi qasek kêm karîne ku guherînkariyan derbixin holê û arîşeyên sereke her wek xwe û di cihê xwe de ne.

Diyare eva bi tenê jin nînin ku diKevin ber tîxa sansora Komara Îslamî, belkî kêmaniyên olî jî digire. Di paragrafa 12 a yasaya bingehî a Komara Îslamî de hatiye ku mesebê fermî di Îranê de Şî'eya 12 îmamî ye, lewma Sunî nikarin bona posta serkomariyê di Îranê de xwe berbijêr bikin.

## Şikûfe Qubadî

Heya niha Şêvra Nobedar, îzin nedaye tu jinekê ku li hilbijartinên serkomariyê de beşdariyê bike, û ew yek jî vedigere ser şêweya bîrkirina olî û çanda serdestbûna mêr ya zal bi ser vê nizamê de ku ji bîreke kevn û konservatîv ya olî ve çavkanî digre.

Armanc ji destepeyva "Recolê mezhebî" ew e ku tenê mêr dikarin li hilbijartinên serkomariyê de xwe berbijar bikin, û hem jî ew kes divêt Şîe û dozdeh îmamî bin. Ya rast ew e ku peyva "recol", bi wateya kesayetî nine û rast bi wateya "mêr" e. Hekî ne li Îranê de gellek jinên siyasî û jêhatî hene ku dikarin li hilbijartineke azad de xwe bo posta serkomariyê berbijar bikin, û heke deng bînin dikarin bi başî welatê xwe birêve bibin.

Ew sivikatîpêkirin rast vedigere bo vê bîr û hizra ayînî û Îslamî, ku jinê wek nîva mêr dihesibîne. Di sîstemekê de ku şahidîdana du jinan bi qasî mêrekê ye, û du jin bi qasî mêrekê mîrat ber wan dikeve, û jin di warê bîrkirinê de netewaw û nivîşkan tê hesibandin, û mêr li gorî yasa û li gorî şer'î mafê anîna çend jinan bi hevre heye, bê guman li sîstemeke weha de mirov nikare çavnihêrê vê yekê be ku bîrkirina wan li ser jinê biguhere...

## Şehîn

Doma R: 6

www.arsivakurd.org

Doma R: 5




## Behmen Soltanî

Yasaya bingehî a her welatekê pira navbera deshelat û xelkê ye. Yasaya bingehî a Komara Îslamî jî ku 34 saliya temenê xwe derbas dike, her di despêkê de ji aliyê mêran û di rewşa şoreşê de û li ser bingeha îdolojiya Îslamî û mesebê Şî'eya 12 Îmamî hatiye avakirin û têde jin bi regeza pile du û bindestê mirov ku regeza pile yek e, maf jê re hatiye diyarî kirin.

Benda 115'ê ya yasaya bingehî ya Komara Îslamî ku taybet e bi taybetmendiyên serkomariyê dibêje, serkomar dibe "Recol", Mesebî û siyasî be. Peyva "Recol" ku peyvek Erebî ye bi wateya mêr tê, lewra ket ber dijatiya jin û rewşenbîran, lewma karbidestên Komara Îslamî gotin ku armanc ji "Recol" regez e, ne kesatî. Îsal ku gera yazdehemîn a hilbijartinên serkomariyê di Îranê de wê reve here, di despêkê de çend jina xwe berbijê kir, lê her weke gerên derbazbûyî ji aliyê Şêvra Nobedar ve kêrhatîbûna wan nehat qebûlkirin û her di vê peywendiyê de Ayetulla Yezdî ragehand ku jin nikare bibe serkomar.

Jinan li warê xwendin û pêşkevtinê de xwe mandî kirine û heta li pêşiya mêran de ne. lê mixabin di civaka Îranê de û bitaybet di çend salên derbasbûyî de, deshelata siyasî û biryardanê di destê mêran de bûye. Sebeba vê yekê jî vedigere bo yasaya bingehî a Komara Îslamî ku mafên jin û mafên yeksanbûna jin û mêran binpê dike.

Bi giştî di yasaya bingehî a Îranê de deshelata siyasî li ser bingeha regez tê diyarîkirin û mafê vê yekê bi jinê nehatiye dan ku here nawendên deshilata siyasî bitaybetî posta serkomariyê ku piştî Welîyê Feqîh, kesê duhemîn ê deshilatdar be. heta jinên "mûctehid" jî mafên wekhev digel mêran tunînin û piştî mêran hisab ji wan re tê kirin.

## Gulale Kemanger

Eva ku pênaseya rohn ya "Recolê Siyasî" çî ye, gellek bas li ser hatiye kirin, hinek kes li dema şiroveya vê destewajeyê de dibêjin ku "Recol", bi wateya "mêr" nine û li vir de armanc kesên xwedî şiyan û kesayetiyên navdar di warên siyasî de ne. Ew kesane li gorî bekgirawenda ayînî û dînî a xwe, ji kanala şirove yê ve dinêrne her tiştî, û jêve ne ku jiber ku nivîsên olî, têne şirovekirin, bi heman şêweyî yasaya bingehîn jî tê şirovekirin, li halekê de hem yasadaner, û hem jî berpirsê guherîn û pêdeçûn û rohnkirina yasayê heye, û di vî biyavî de ew jî heman Şoraya Nobedar e. Vê şorayê heya niha jî bi tu awayî ranegehandiye ku "recolê siyasî û mesebî", jinan jî bi xwe ve digre.

Li dema pesendkirina yasaya bingehîn de jî ji aliyê hinek kesan ve, ew yek hatiye baskirin ku erkê serokkomariyê wek erkê dadwerî û rêberiya civakê nine ku jin nekarin bigirne stûyê xwe, lê nûnerên parlementoyê bi dengê giştî li ser vê baweriyê ne ku serokkomarî heman "hakimiyet", û serokatî ye ku li gorî yasayên îslamê jin nikarin têde beşdar bin. Eva tiştek e ku hem pala xwe daye deqên ayînî, û hem jî yekdengiya kesayetiyên siyasî ên Îranê li ser hebûye. Lewra eva ku basê vê tê kirin ku "recolê siyasî" jinê jî bi xwe ve digre, baseke lawaz e, û mêrbûn yek ji şert û mercên sereke ên serkomariyê di Îranê de ye.

Bi raya min ew şêwe sivikatî kirina ku hem li yasaya bingehîn de heye û hemî jî gellek caran ji ziman berpirsyarên rejîmê ve tê bihîstin her hemû jî vedigere bo cîhanbînî û çandekê ku têde jin jîndareke natewaw e, heya vê demê jî ku cîhanbîniya olî û îslamî bandora xwe li ser siyaset û û deshilatê danê, û yasa li ser bingeha îdeolojî û ayînê bêne dariştin boçûnên weha ji hêla gellek kesan




ve tê çavnihêrkirin.

# Amerîka:
# Îran piştgiriya terorê dike



**Dewleta Amerîka dibêje ku Îran bi taybet ji rêya Hizbullaha Lubnanê ve piştgiriyê ji terorîzma navnetewî dike.**

Di rapora terorîzma sala 2012'an de navên wan welatên ku di lîsteya terorê de bûn nehatiye guhertin û Kûba, Îran û Sûriye di lîsteya terorê de cih digrin.

Di vê navberê de navê Îranê wek "Xetakarê herî xirap di warê piştgirî ji terorîzmê" hatiye pir rengkirin, û Sûriye jî bi sedema tepeseriya bêrehmane ya dijberên xwe hatiye şermezarkirin.

Di raporê de hatiye ku piştgiriya Îranê ji terorîzmê di wan salên dawiyê de, piranî ji rêya hêzên Quds a Sipaha Pasdaran a Îranê û girûpên ser bi Hizbullha Lubnanê ve hatiye encamdan.

Di vê daxuyaniyê de hatiye: "Çalakiyên terorîstî ên Îran û Hizbullahê, gihiştine astekê ku di dehsalên 1990'î de jî, weha nebû.

www.arsivakurdi.org

# Hilbijartinê guhertin pêk anîban, rejîmê nedikir



Selîm Zencîrî

Nimayîş û şanoya ku her çar salan carekê ji aliyê Komara Îslamî ve tê birêvebirin, wa dîsan amade ye bikeve ser dikê. Maşkanêyek ku li du beş û perdeyan de birêve diçe. Perdeya yekemîn û sereke ku li civînên nepenî û li pişt perdeyan ji aliyê hakimiyetê bi serokatiya weliyê Feqîh ve birêve çû û Konseya Nobedar a rejîmê 8 kes li parzînka xwe de derbas kirin û hilbijartinek li nav binav hilbijartinê de kir.

Perdeya duyemîn û girîng jî ku qirare çend rojên din bê lîstin pêwendî bi raya giştî a Îran û cîhanê ve heye ku carek din jî bên xapandin û wusa nîşan bidin ku rejîma Îranê, sîstemek demokratîk e û hikûmetek xelkî ye û rewatî û meşrûîyeta xwe ji xelkê werdigre!.

Li rastî de ceribîna 34 salên derbasbûyî, him xelkê Îranê û him jî raya giştî a cîhanê û rojava re eşkere kiriye ku îdeolojiya kevneşopxwaz û paremayî a rejîmê roj bi rojê çirtir û tîrtir dibe û nikare çi hizr, ayîn, meseb û regezên cuda ji xwe bipejirîne û heta rehmê bi hevçeperên xwe jî nake. Lewma ew kirasê demokratîk ku çar salan carekê li xwe dike û rewatiyê ji xwe re pê misoger dike, li bejna wê nayê û gelek jêre fireh e. Wate ew gurê ku hetanî niha hewil daye xwe li kewilê pez de veşêre, bi kiryarên hovane rûyê rastîn ê xwe eşkere kir.

Lewma niha ku Weliyê Feqîh û lîstikvanên perdeya duyemîn bi gef, girtin û ewlehîkirin û herweha lahî û dalahiyan ketine canê xelkê da ku bi beşdariya xwe ''Hemaseya Siyasî''a Xamineyî û nimayîşa wî bidawî bînin.

Bêhay ji vê ku şanoya wan bê temaşavan e û xelkê Îranê bi lîstikên wan hesiyane û nabine alîkar bo serxistina maşkanêyekê ku li pêxem dirêjkirina temenê rejîmê de ye. Gelên Îranê heta eger hafize û bîrdanka dîrokî a xwe jî ku tejî ye ji cinayet, neheqî û bêbextiyên rejîmê derheq wan, nexînin kar, lê mentiq û hişyariya siyasî a wan bi qasekê ye ku êdî bi xwe çarenivîsa xwe diyarî bikin û naçine nav lîstikekê ku dizanin dê her dorandî bin. Ew bi tehrîmkirin û neçûna ser sindoqan, dê keramet û kesatiya tehqîrkirî a xwe ku 34 sal in ji aliyê rejîmê ve tê pêpeskirin bidest bixin û nabine alavek bo serxistina pîlanên rejîmê û dirêjbûna temenê wê.

Çûnku 8 berbijarên serkomariyê, kesên helandî li nav mekteb û îdeolojiya wilayeta feqîh de ne û tu yek ji wan derheq xizmet bi xelkê û pêşeroja Îranê de nafikirin û pilan û bername jî ji bo vê yekê nînin, xincî parastina nîzamê û temendirêjiya wê. Ku waye ew gotina Mark Tuwayn li ser Îranê tam li cihê xwe de ku li sîstemên nedemokratîk û dîktatorî de ku azadî nine, ger helbijartinê û dengê xelkê karîba guhertinekê pêk bîne, eslen îzna birêveçûna wê nedihat dayîn. Lewma êdî dema wê hatiye ku bi neçûna ser sindoqan''NA''yek mezin bibêjne rejîmê û bibine destpêkek bo xebatek bihêz a medenî bo azadî û demokrasiyê re bi her nirxa heyî, ku bêşik çax û zeman û raya giştî bi wan re ye.

# Miqesokên bê nav ên Îmam Zeman di esmanê Turkiyê de



Adil Muradî




Gelek caran bi bihîstina navê sîxoran, rûçikê mêrekê di mêjiyê me de çêdibe. Eva di demekê de ye ku bi dirêjahiya dîrokê kêm nebûne ew jinên ku bo bidestveanîna zaniyariyên nepenî ên welatan ji rêyên curbicur û anîn û birina zanyariyan qedera şer û rewşa welatan beravajî kirine.

Du sedemên sereke bona bikaranîna jinan bo kar û barên sîxoriyê hene: Yekemîn ev e ku jin kêmtir cihê şik û gumanê ne. Sedemek din jî ev e ku hertim jin dikarin bi mifahwergirtin ji xweşikî û balkêşiya rûçikê xwe ê jinanî, mêran bixapînin û zaniyariyan ji devê wan de derxînin.

Em dikarin jinên sîxor bi ser du desteyan de parve bikin, jinên sîxor ên asayî û sîxorên ku heyamek berî niha bi "miqestok" hatine naskirin. Miqestokan hertim bi liberçavgirtina kêmasiyên siyasetvan û rayedarên şehwetbaz û bi mifahwergirtin ji şiyanên xwe ên cinsî, karîne ku pilanê sîxorî ên welatê dilxwaze xwe cîbicî bikin.

Li gor gotinên Miqestokekê xwe xweşikkirina jinan yek ji rêyên herî goncav di karûbarên sîxorî de ye, ew jina sîxor herweha dibêje ku, jin di hindek

**Dom: R 9'ê**

www.arsivakurdi.org



Mistefa Pîranî kurê Mihemed Emîn, sala 1343'an (1964) li gundê "Qozlû" a ser bi navçeya Hewşarê, di malbatek hejar de tê dinê. Mistefa weke tewahiya zarokên din temenê zarokatiya xwe derbaz dike heya dema xwendina wî digîje. Ew diçe xwendingehê û piştî tenê salekî, mixabin bi sedema mêrserdestiya ku di malbata wî de heye, rêya xwendinê ji aliyê Mihemed Emînê bavê wî tê girtin û Mistefa bi neçarî rû li şivan û gavaniyê dike û piştre heyamê du salan weke kedkar dice bajarê Tehranê.

Mistefa Pîranî derheq nasîn û tevlîbûna xwe bi PDKÎ re dibêje; "Di despêka sala 1358'an (1979) de, min PDKÎ nas kir û di heyva Reşemeya sala 1361'an (1983) de tevlî refên kadr û pêşmergên partiyê bûm".

Mistefa di doma gotinên xwe de dibêje; "Gellek sedem hebûn ku rêya tevlîbûna bi PDKÎ ji min re nîşan dan, bo mînak; Yekemîn ev bû ku armancên PDKÎ armancên xelkên Kurdistanê bûn, ya dûyemîn ew bû ku take partiya opozisyona Îranî bû ku li seranserê herêma Hewşarê binke û baregehên xwe ava kiribûn, ya sêhemîn jî ew bû ku hevalek devrana zarokatiya min di nava refên pêşmergên partiyê de şehîd ket û şehîdbûna wî pitir xwîna min bi coş anî ku bibim pêşmerge, û sedema çaremîn ew bû ku kakila Komara Îslamî bo min bêtir ji caran eşkere bû û min baştir nas kir ku rejîmek çiqas hov e".

*"Sala 1985'ê li Gewredê, Dr.Qasimlo civînek bo pêşmergên hêzêzn Seqiz, Hewşar û Dîwanderê pêk anî û di vê civînê de bû ku bo cara yekemîn min şehîd Qasimlo dît û ez pir dilxweş bûm ku min rêberê xwe ji nêzîk we dît, lê piştî vê du carên din jî min rêberê xwe dît".*


Mistefa Pîranî

Mistefa Pîranî derheq rojên xweş û nexweş ê jiyana xwe dibêje; "Piraniya rojên jiyana pêşmergetiyê bi êş in, lê roja herî bi jan û nexweş roja şehîdketina Dr. Qasmlo û hevalên wî bû û tu caran ew roj li hizra min de der nakeve. Lê di hember wê de rojên xweş ên jiyana min jî kêm nînin. Bo mînak roja raperîna xelkê Başûrê Kurdistanê di sala 1991'ê de rojek pir xweş bû bo min, herweha sala 1985'ê li Gewredê, Dr.Qasimlo civînek bo pêşmergên hêzêzn Seqiz, Hewşar û Dîwanderê pêk anî û di vê civînê de bû ku bo cara yekemîn min şehîd Qasimlo dît û ez pir dilxweş bûm ku min rêberê xwe ji nêzîk we dît, lê piştî vê du carên din jî min rêberê xwe dît.

Mistefa derheq jiyana xwe a hevpar dibêlje: "Min di payîza sala 1374'an (1995) de jiyana hevpar digel Ferîde Mihemedzade Pêk anî û berhema jiyana me jî kur û keçek in".

Mistefa Pîranî dibêje: "Raste ku birayek min bi navê Mihemed Kerîm Pîranî di nava refên Kadr û pêşmergên PDKÎ şehîd ketiye û canê xwe pêşkêşî baregehên azadiyê kiriye, û herweha min bi xwe jî pitir ji 30 sal temenê xwe gorî rêbaza şehîdên kurdistanê kiriye, lê jiber ku ez bi du armacek pîroz re hatime û daxwaza mafên xwe dikin, ez pir hêvîdarm bi pêşeroja gelê xwe û xatircem im ku emê serkevtinê bi dest bixin. Hekî em li şoreşên din ên cîhanê binêrin dibînin ku, ew jî her weke me xebat û berxwedana xwe domandine heya gehiştine serkevtinê."

Birêz Pîranî di dawiyê de rû li xelkê Kurdistanê dike û dibêje: "Herwek heya niha xelkê Kurdistanê selimandine ku berxwe didin, û li pişta pêşmerge sekinîne û li hemû aliyan de li hemberî hikûmetên zal bi ser Kurdistanê bitaybet Komara Îslamî de disekinin û pîlanên wê pûç dikin, daxwaz dikim ku li ser vê berxwedana xwe berdewam bin, jiber ku armanca wan pîroz û rewa ye.

Hevpeyvîn:Faxir Molûdî



www.arsivakurd.org

# Hibijartina serkomariyê û Jinên Iranê



**Perî Îslamniya**




Çend rojek bo 11'mîn dewra hilbijartinên serkomariyê li Îranê maye. Hilbijartina serkomar û hilbijartinên civatên gund û bajaran îsal bi hevre ne. Tirs, şik û guman, û bêbawerî zor di nav gelên Îranê de heye. Lê li derveyî Îranê çaven hemû dewletên dost û neyarên komara Îslamî li ser hilbijartina vê mehê ye.

Heta niha li hemû hilbijartnan de gelê Îranê hatiye xapandin. Çend sala berî niha jin û ciwanên Îranê bi dirûşmên drevîne Xatemî hatne xapandin. Li sala 2009'an şûnde, dîsan jin û ciwanên Îranê bi hêvîyekê pir mezin çûne ser sindoqên hibjartinê. Lê mixabin me hemûyan dît ku ew hilbijartin tenê sergirêdanek bû, û naweroka wê vala bû.

Her li sala 1979'an ku Komara Îslamî, gelên Îranê wek kole kire bin desthilatdariya xwe de, wê rejîmê hemû maf û kontrola gelên Îranê kire bin zêhniyata peşkevtiye xwe de.
Di bin siya vê rejîmê de, Kurd, Belûç û Turkemen li ber wê hendê ku sonî ne, qet mafê vê nînin ku xwe bo posta serkomariyê berbijar bikin. Cuda ji vê ku ew hinde zulma netewî, kulturî, civakî ,abûrî ....û hwd li wan tê kirin.
Jinên Îranê her li despêka vê hikûmetê de, ketine ber tofana qehr û nefretê.

Di Destûra Bingehîn a Komara Îslamî ya Îranê de, çi xalek demokratîk ji bo mafên jinan nehatiye berçavgirtin. Bêhurmetiyên herî mezin di Destûra Bingehîn ya Îrane de, li hember jinan hatene kirin. Mirov pêwîst nake ku hetmen yasa nas be bo vê ku li wan yasayên nemirovane têbigîje.

Ezê tenê îşarê bi çend ji wan xalan bikim û gellek zû ev rastiye derdikeve holê. Xalên weke: Du jin bi yek şahid zanîn, sîxe, mêr dikarin li gor dilê xwe çend jinan li xwe mare bikin, mêr dikarin heta çar jin hebin, jinan mafê veqetiyan û cudabûne ji mêr nîne, lê mêr her dema ku dilê wî xwast, dikare jina xwe berde, û jin nikare bibe Qazî. Jin mafê serperestiya zarokan nîne. Jin ji mafê mîratê de, gellek kêm ber dikeve. Bi kurtî, mirov dikare bibêje ku hemû yasayên Îranê li dijî jinê hatine darêtin ku bingeha vê yekê îdeolojiya "Welî Feqih" e.

Jinên Îranê hindek daxwazî li dewra 10'mîn a serkomariyê hebûn, bo nimûne: Îran dibe konvansiyona dijî tebîz li jin qebûl bike û çend xalên wek 19, 20, 21, û 115'ê ya destûra bingehîn biguhere.

Mirov dibîne ku jinên Îranê êdî hatine ser vê baweriyê ku ew rijîma qet li destûra bingehîne xwe de guhertine pêk naîne.

Piştî heşet salên pir ji zulm û xiyanet bi gelên Îranê, Ehmedînijad ew perên petrolê ku soz dabû bîne ser sivka feqîr û hejarên Îranê, pêşkêşî Hizbullahê û çêkirina binkeyên terorîstî li welatên Îraq, Vênzoêla, Lubnan û deverên din ên cîhanê de kir.

Ji aliyek din ve rejîm ku dizane tewaw pêgeha xwe li nav xelkê de ji dest daye, lewra niha biryara xwe daye ku du hilbijartinan bihevre birêve bibe.
Jinên Îranê bila pêş hemû tiştî de karnama wan heşt kandîdan bixwînin û şirove bikin. Jinên Îranê divêt li xwe pirs bikin ku gelo heke min wek jin ew mafa nîne ku xwe ji bo posta serkomariyê kandîd bikim, çima beşdariyê li hilbijartinek weha de bikin?

---

Doma R: 7




me'muriyetan de bêtir ji mêran kar dikin. Bo mînak mêrek ku dixwaze ji herêmek qedexe derbas be, xwediyê şansek kêm e bona peydakirina rêya rast, lê şansa serkevtina jinek dev bi kenî û xwe xweşik heye.
Eva ku li gor şahidên dîrokî em dikarin bêjin ev e ku, sîxorî û perwerde kirina Miqestokan, bûye çekek nepenî di destê deweletan de û her welatek bi awayek teybet bi xwe mifahê jê disitîne.
Ev rastî ku heta mêrên herî bi hêz jî renge li hember balkêşiya jinan de teslîm bin, û eva ku jin bi sedema hêza xwe ya çend alî cudahiyek zêde ji mêran hene, û li şerê nerm û veşartî de tên bikar anîn, lewma hokara sereke bona handana dewletan di ware perwerde kirina sîxoran jin in. Di vê navberê de hikûmeta terorîst a Komara Îslamî jî li vê çarçoveyê bider nine. Bi awayekî ku di çend rojên derbazbûyî de nûçeya desteserkirina tîmek ji jinên Îranî ên ser bi Sipaya Pasdaran, li Bajarê "Îxdîr" a Turkiyê, bi tawana sîxorî li ser rayedarên leşkirî, ewlehî û dewletî ên wî welatî, li jêr navê rûspîgerî û zewicînên demekî digel wan rayedaran, belgeyek din ji karên qirêj ên Komara Îslamî li cîhanê eşkere kir.
Komara Îslamî derheq mifahwergirtina ji taybetmendiyên fîzîkî û rûçikî ên rejîmê, û perwerde kirina jinên rûspî, bi tenê wan bo emelyatên derveyî sînoran bikar naîne, belkî di navxwe a Îranê û bitaybet herêmên Kurd akincî jî siyaseta geşandina fesad û fehşa û hiloşandina bingeha malbatî bi kar aniye, jiber ku di civakekê de dema bingeha malbatê lerizî, arîşe derkevin holê û eva jî mînakek e ji şerê nerm êKomara Îslamî tevî netewa Kurd.

Bi çavpêxişandinek bi ser sêrwîsên îtila'atî û ewlehî yên Komara Îslamî, ew yek derdikeve ku bona hingavtina armancên xwe ên qirêj di navxwe û derveyî sînoran de, ji tu karekê destê xwe naparêze û mifahwergirtina wek emraz ji hunermend, zana, jin û zarokan bona sîxorî û bidestveanîna zanyariyan, yek ji fêlên Komara Îslamî ye.

Cihê hêvîyê ye ku jin bikarin bigîjepileya bilind a mirovî û hiqûqî ya xwe, da ku derfeta jiyanê bo nifşên pêşerojê bê dabînkirin.

# Bi şaşî Garîdo kirin şaciwan







Donîz Garîdo, yek ji beşdarên pêşbirkêya şaciwanên kanada, 24 demjimêr bi ser xweşiyên wê de derbaz nebibû ku naznavê şaciwaniyê jê sitandin.

Rêveberê pêşbirkê, hêceta vê anî ku şaşiyek taypê hebûye û berpirsê nivîandin û taypkirina wan navan wek berpirsyarê vê şaşiyê da zanîn.

Di vî warî de Garîdo ragehand, "Nûçeya jê wergirtina vî naznavî ez tuşî heyrîmanê kirim, min wa dizanî ku xewnên min bi cî hatine, lê ji nişkêve ev naznav ji min hat sitandin.

Keçeke din ya temen 26 salî bi navê "Rîza Santos" bû xwediyê vê naznavê.



# Xwendingehek ji bo perwerdekirina siyasetvanan



Her tim doktur û pirofisorên warê Saykolojiyê vê yekê ducarî dikin ku heke civakek bixwaze kesên mezin û jêhatî berhem bîne, divêt bo bidestveanîna wan armancan pîlan û rêyên taybet di zarokiyê de bigire pêşiya xwe.

Xwandingeha "Îton" yek ji wan xwendingehan e ku her ji destpêka avakirinê de ev rêye bikar aniye û heya niha deyan xwendekarên vê xwendingehê piştî bidawîkirina xwendinê, bûne serkirde û siyasetvanên navdar ên Birîtanya, ku li berevpêşveçûna welatê xwe de rolek bilind hebûne.

Xwendekar her di destpêka xwendinê di wan xwendingehan de, radigehînin ku ew di pêşerojê de wê bibne pêşeng û serkirdên welatê xwe, ji ber vê yekê pêdvî ye ku ji niha pêve hest bi berpirsayetiyê bikin û xwe bo rewşek weha amade bikin.



Ev pirsiyar û sedan pirsiyarên din di taqîkirina xwendingeha " Îton" de tê dîtin.

Dîvîd Kamêron, serokwezîrê Birîtaniya û Borîs Conson parêzgarê Lenden yek ji van xwendekarên serkevtî ên vê xwendingehê ne.

Xwendingeha Îton yek ji van xwendingehên Birîtaniyayê ye ku heya niha tenê kur dikarindi vê xwendingehê de bixwînin û rê nadin ku keç jî bixwînin.

# Gotinên Pêşînan

A: Çiya Mazî



**Dilê bêkesan li ser hemû kesî dişewite:**

Kesê bê kes dilşewat e. Dilê wî li ser herkesî dişewite lewre ew pir di astengîyan re derbas dibe herwha xwe tenê dihesibîne û dibêje qey herkes wekî min e. Ji ber tenêtî kişandiye jî mirovên bêkes naxwaze kesekî din jî wekî wî bêkes bimîne.

**Dilê dê bi ser dotê ye, ê dotê bi ser çiyayê Qaf de ye:**

Ev jî wekî "berê xweha li bira yê bira li çiya ye". Lê carna dê heye ku tim dilê wê li ser zarokên wê diêşe lê mixabin dizewicin û diçin.

**Dilê mêvana nehêle, wê bi xwe herin:**

Mêvan çiqas tamsar bin jî, çiqas nehêjayî hurmetê bin jî, ne hewceyî ku mirov wan biqewirîne lewre ew dê bi xwe herin.

**Dilop bi xwe cîhê xwe çê dike:**

Tiştên xwezayî, mirov destê nede jî ew bi xwe xwe diguherînin. Tiştin hene ku mirov divê dest navêjê ji bo ku bi xwe bijî an çê bibe, heke mirov mudaxele bike dibe ku ji dirûvê xwe derkeve û şaş çê bibe. Carinan bûyer bi awayê xwezayçê bibin baş e.

www.arsivakurdi.org

# Şaristana Sehne

**A: Adil Muradî**



Şaristana Sehne li rojhilatê parêzgeha Kirmanşahê, û xwediyê du beşan bi navên beşa Nawendî û beşa Dînwer e. Nifûsa vî şaristanî 85000 kes e.

Ji çiyayên wê em dikarin qala çiyayê "Qollê Hicr", "Çerşekan", "Kelaxan", "Êmrole", "Teklû", "Nixod Çal Sowîl", û "Çihar Çalab" bikin.

Xelkê vê herêmê Kurd û Lekî ne, û ew şaristan ji du bexş, du nawendên bajar, heft gundistan û 185 gundan e.

Li gorî zanyariyan pêştir navê vê şaristanê "Sane" bûye. Yaqût li pirtûka "Mo'cemol Boldan" li sala 632'an ya heyvî de dibêje ku: "Sehne" wate rengê rû û ciwanî. Bi awayek din ew nav ji peyvek Evistayî bi navê Se'ne hatiye wergirtin ku navê teyrê bi navê Şahîn e. Jiber ku ew teyr her tim bi ser şaristana Sehne de difiriya, navê vî teyrî li ser vê herêmê hate danîn.

Ji cih û warên dîrokî û cihên geryanê li vê herêmê de em dikarin qala wan cihan bikin:

Şikevta Hacî, şikevta seyîd Şehab, Îmamzadeya Ebbas Elî, Îmamzadeya Mehmûd, Îmamzadeya seyîd Îbrahîm, Îmamzadeya seyîd celaledîn, Îmamzadeya Pîr tekan, Pira Xosrewî, Pira Nûjî wan, Hemama pa çemen, ziyaretgeha Şoq Elî, ziyaretgeha Txt Teymûr, Kelha Hejîr, Kelha Merwan, qebrê kevrîn ya Keykavûs.

---

*Beriya ku ez fêrî zimanê Kurdî bibim bi alîkariya wergerê min çanda Kurdî dixwend. Lê niha ez fêrî Kurdî bûme, mirov wêjeyê bi zimanê wê yê orjînal bixwîne xweş e, ev yek dilxweşiyekê dide dilê min.*

**Jina Polonî "Dr. Joanna Bochenska", di Enstîtuya Zankoya "Jagillonian" a Poloniya de, di beşa Xebatê "Ariental" de li ser çand û wêjeya Kurdî dersê dide. "Dr. Bochenska" destnîşan kir, ku zarok pêşeroja civakê ye, lewma bang li malbatên Kurd kir ku bi zarokên xwe re bi Kurdî biaxivin.**

Wê li gotûbêjekê de ku ajansa ANF'ê pêre pêk anî, di vê derheqê de weha got: "Min cara yekem Kurd û çanda Kurdî 13 sal berê naskir. Ez ji bo li ser wêjeya Rûsî û akademiya sînemayê bixwînim hatibûm Moskowayê.

Li vir min Kurd nas kir, û bala min kişandin. Di serî de min çend pirtûkê ku li ser çand û wêjaya Kurd a bi Rûsî hatine nivîsandin min kirî û xwendin. Ev mijar ji bo min nû bû û bala min pirtir dikişand ser xwe.


Ji ber vê yekê min xwest têza xwe ya doktora li ser wêja çand û rewşa Kurdê Bakûrê Kurdistanê bikim.

Ji ber vê yekê di serî de min xwest zimanê Kurdî fêr bibim. Beriya ku ez fêrî zimanê Kurdî bibim bi alîkariya wergerê, min çanda Kurdî dixwend. Lê niha ez fêrî Kurdî bûme, mirov wêjeyê bi zimanê wê yê orjînal bixwîne xweş e, ev yek dilxweşiyekê dide dilê min. Ez dixwazim ev berhemên Kurdî ji bo zimanên din jî werin wergerandin. Bi taybet ji bo zimanê min yê zikmakî zimanê Polonî".





www.arsivakurd.org

AGIRÎ
Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Tel: (+)9647503640792




# Ev stêrkên ku hez dikirin hevjîna wan ji wan biçûktir be




Malpera Xendan navê wan stêrkê di warên sînema, stran û mûzîkê de belav kirine ku di jiyanê de hez kirine ku hevjîna wan ji wan biçûktir be.

Navên wan stêrkan bi vî awayî ye:


1 . Can Kilîd û Cênîfêr wîd, cudahiya temenê wan 31 sal
2 . Rodnî Dencêr Fîld û Con Çayild, cudahiya temenê wan 31 sal
3 . Dênîs Hopêr û Kasrîna Lanasa, cudahiya temenê wan 31 sal
4 . Dênîd Hopêr û Vîktorya Dofî, cudahiya temenê wan 35 sal
5 . Hodî Alîn û Son Yî Pêr Vên, cudahiya temenê wan 35 sal
6 . Dîs O Kornêr û Cûdî Birok Wîlsin, cudahiya temenê wan 35 sal





7 . Hok Hafner û Kîmbêrlî Konrad, cudahiya temenê wan 37 sal
8 . Patrîk Sîtward û Sanî Ozêll, cudahiya temenê wan 37 sal
9 . Patrîk Sitward û Wilîza Dîllon, cudahiya temenê wan 39 sal
10 . Ronî Hûd û Îkterîna Vînova, cudahiya temenê wan 41 sal
11 . Frîd Îsteyr û Royin Sims, cudahiya temenê wan 45 sal
12 . Dik Van Dak û Êrlî Sîlver, cudahiya temenê wan 46 sal
13 . Tonî Randal û Heysar Harlin, cudahiya temenê wan 51 sal
14 . Hog Hafner û Holî Madîsin, cudahiya temenê wan 54 sal
15 . Hog Hafnêr û Kirîstal Harîs, cudahiya temenê wan 60 sal
16 . Hawird Marşal û Ananîkol Sêms, cudahiya temenê wan 63 sal.

# Temenê wî sê sal e, lê fotogiraferek pirofişnal e



Zarokek sê salî ê xelkê welatê Nîcêriyê bi navê "Fûcî", bi zarokatiya xwe hewil dide ku bibe fotogiraferek pirofişnal.

"Fûcî" rengê zarokên hevtemenê xwe nade û berevajî wan ku bi pêlîstokan dilîzin, bi kamêrayê dilîze û bi wêneyên wî cihan heyirî maye.

Fûcî li bajarê Lagosê dijî û hertim mijûlî girtina wêneyên malbat û dîmenên bajarê xwe ye û dixwaze ku di çend rojên dahatî de pêşangehekê bo wêneyên xwe ava bike.

www.arsivakurd.org